

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar ( 136) Sal 22 Berfenbar 2017 z - 2629 k Êmêl : Newroz@yek-dem.com Buha (75)L.S

## Saleke Nû
## Helwesteke Nûkirî

**Desteya sernivîser**

Ji destpêka serhildana xelkê Sûriyê de, helwesta lawên gelê Kurd zelal û aşkere bû. Wan bi gelê Sûriyê re doz û daxwaza azadî û rûmetê parve kirin, lê ew bi çekirina wê re ne hevpar bûn.

Wan berdewam digot jî, destpêka çi çareseriya qeyranê bi agirbestê dest pê dike û niha jî dibêjin, ku agirbest pêngaveka yekem ya herî rast e.

Rast e, ku her lihevkirinekê şert û mercên wê yên cuda hene, lê dîsa jî em kanin bibêjin, ev lihevkirinên ku hene û hemî tiştên ku li derdorê dibin, ne yên dawiyê ne; çimkî zincîra çareseriya qeyrana Sûriyê dirêj e, evên niha çêdibin jî xelekine nû ji wê zincîrê ne. Ji ber ku hîn şert û mercên çareseriyê tewaw nebûne. Zor pêwîst e ku destên me Kurdan di hev de bin, çinkî nakokiyên me yên sereke bi neyarên gelê me re ne yên di navbera me de.

## Qurbaniyên Terorê Li Gundê Celemê!



Li roja 18 miha Cotmehê, dema ku mala rêzdar Ehmed Mihemed Seyid ji gundê Celemê- Efrînê ji ber berfkirina zêtûnan diçûn nav hêrê zêtûnên xwe, mayînek di bin direktora wan de peqî û di encamê de kebaniya malê xanim Lem`an Qadir û du kurên wê Qadir Ehmed û Cum`a Ehmed jiyana xwe ji dest dan û du kesên malbatê jî birîndar bûn.

Gundê Celemê li ber Çiyayê Lêlûn li nêzîk gundê Etmê bi ser parêzgeha Idlibê ve ye. Li detpêka qeyrana Sûryê, ew dever ciyekî şer û pevçûnan bû di navbera hêzên ypg û terorîstên El Nûsra, Da`iş û pêgirên wan de. Loma jî wan gelek mayîn li wan deran çandine û li şûna xwe hîştine û vekşîne. Mayîna ku peqiya jî ji bermayên wan terorîstan û karên wan ên çepel bû.

Bi navê weşana Newrozê, nivîskar û xwendevanê wê, em serê malbata wan pakrewanan, şêniyê gundê Celemê û hemî berketiyên wan xweş dikin û dibêjin bila serê wan xweş be. Rûreşî û mirin jî ji terorîstên bê niyaz re.

## Rêjeya Sedî Çel a Hilbijartinên Borî Ne Dadmend Bû

**Qaziqlî Mihemed**

Li 01.12.2017 lan hilbijartinên encûmenên xwecihî (bajarok, navçe, kanton) ya Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyê li darketin. Di wan hilbijartinan de, lîsteyên kutleyên siyasî hebûn û berendamên serbixwe jî li gelek deveran dihatin dîtin. Tiştê balkêştir ew bû, ku milmilaneke biratî di navbera wan lîsteyan de pêk hat. Komîseriya bilind a hilbijartinan jî bi rêkûpêk bi erk û stubariya xwe rabû. Pêkhateyên Bakurê Sûryê bi tevayî û gelê me yê Kurd bi taybetî, bi coşeke mezin berê xwe dan.........2



# Ne Cinêf, Ne Esîtana û Ne Sotşî… Tu Encaman Nadin

**Memê Alan**




Aqilmendî û ezmûnên dîrokê diyar dikin, ku çareseriya çi kirîzê beçi mezin çi biçûk- bi riya guftûgo û danstandina aliyên wê çêdibe. Ji bilî vê şêwerêyê, ew qeyrana wê her here bikufite ser hev û bibe girêka kor. Wêlomê jî, ji destpêka qeyrana Sûriyê ve, Tevgera Siyasî ya Kurdî li ser vê yekê tekez dike û dibêje, ku çareseriya leşkerî ne derman e û ya durist çareseriya siyasî ye.

Di vê çarçewê de, gelek pêngavên hevdîtinê di navbera desteya dansitandinê ya rijîmê û hin aliyên rikberiyê de –çi li Cinêvê, çi li Asîtana û çi jî li Sotşî, çêbûn û wê çêbibin. Lê mixabin tu encamên bi sûd ji wan civînan ne hatine wernegirtin û gavavêtineke berbiçav ji çareseriyekê re pêknehatiye. Çimkî ew hevdîtinên ku li darketin ne berpirsiyarane bûn û her aliyek ji beşdaran di bin bandora hin dewletên derve de bûn. Berjewendiyên taybet ên her aliyekî jî ne li gor berjewendiya gelê sûriyê bûn û bi awakî rasteqîn nûnertiya hemî pêkhateyan nedikirin.

Ji ber wê yekê em dikarin bi awakî rasterast bibêjin, eger dewletên ku di doseya Sûriyê de pêwendîdar in, bi taybetî jî Emerîka û Rûsiya li hev nekin, nûnerên rasteqîn ên her pêkhateyeke Sûriyê û bi taybetî yê Gelê me yê Kurd lê neyêne beşdarkirin, berjewendiyên hemiyan-kêm zêde- berçav nebin û ne di bin sîwana civaka navdewletî de be, hevdîtinên ku dê çêbibin– li kû dibin bila bibin- nikanin tu çareseriyeke siyasî, aştiyane û demdirêj ji qeyrana Sûriyê re pêk wînin.

# Pirtûka ((Şerefa Ristem Keya))




Pirtûka "Şerefa Ristem Keya" ya wêjevan û zimanzan Mihemed Emîn Bozerslan e. Ew pirtûkeke kurteçêroka ye, ji deh kurteçêrok, ferhengokekê û ji 120 rûpelên ji pîvana (iso B5) pêk tê. Pirtûk li sala 1992an li dewleta Siwêdê hatiye çapkirin.

Kurteçêrok bi kurdiyeke şêrîn, ciwan, zelal û resen ku hîn bi Tirkîtiyê têkar nebûye hatiye nivîsandin. Lewre jî gava mera wê dixwîne, mera hestiyar dibe, ku mirov li dema bav û bapîran dijî û ciwantiya zimanê kurdî bi xemla xwe ya herî resen, .........

3

**Rêjeya Sedî ... Dûmahîk**

navendên helbijartinê û dengê xwe bi awakî azad, yekser û serbest dan. Hêza asayêşa jî bi şêweyekî erênî bi rola xwe ya parastinî rabû. Wêlomê jî, mirov kane bêje, ku hibijartin bi şêwakî aştiyane, aram û bê rûdawên neyînî bi rê ve çûn.

Wekî ku diyar bû, hilbijartinên ku pêkhatin, tenê ji bo sedî şêst ji endamên encûmenan bûn, sedî çelê ku ma bû jî, ji bo pêkhateyan biçûk (Kurdên Êzdî, Ernawît, Turkmen, Çerkez…) û ciwanan bû. Di hilbijartinan de tu lîste têk ne çûn û para hemiyan di serkeftinê de hebû, ew bi xwe jî tiştekî baş bû. Yanê mirov kane bibêje, ku bi giştî hilbijartin bi awakî erênî û serketî bi rê ve çûn, û rihetîk û vehesek di nav nofên(fîe) fere de ji milet peyda kir.

Lêbelê, nayê wê wateyê ku tiştên neyênî jî tunebûn! Na! hinek kêmanî -çi li vir an li wir- hebûn û nedadî, newekhevî û nevehesî peyda kirin. Ji wan tiştên nedadmend, rêjeya sedî çel ji endaman bû. Ew rêjeya ku rasterast ji lîsteya El-Ume El-Dîmokratiyê ya ku pirtirîn deng wergirtine re çû û lîsteyên din jê hatin bêparkirin. Bi dîtina me, ew biryara ne biryareke dadmend bû û ne li gor tu pîvanên demokratiyê bû. Ger em dixwazin dadmendî û wekhevî di sîstema me ya siyasî, rêvebirî, hilbijartinî de peyda bibe, pêşinyara me ew e, ku gerek e ew ferman û biryar çûna %40 ji dengan ji lîsta serkeftî re, di pêşerojê de were guhertin û her lîstak li gorî rêjeya dengên ku wergirtine para xwe ji rêjeya ji sedî çelî bibin. Çinkî eger wiha ne be, ewê dilsarî û xemsariyê ji hilbijartina û belkî tevahiya sîstema rêvebiriyê jî li ba qewreyên(kiyan-kitle) siyasî û li ba welatiyan peyda bike û baweriyê bi hilbijartinan û bi rêvebiriyê jî lawaz bike. Ew jî hîç ne ji berjewendiya gel, civak û tevgerana siyasî ye û dibe nimûneke ne baş ji pêşerojê re.

# Gefgurên Turkiyê û Rijîma Sûriyê... Gelê Kurd Naceflînin

**Q. Mihemed**





Gelê Kurd li Sûriyê, miletekî xwedî xaknîgarî, dîrok, çand û ziman e. Ew ne koçber an penaber e. Wî ji ber zulim û zora salane û pirojeyên awerte ji aliyê rijîmên destlatdar ve li Sûriyê, ji dehsalan de dest bi xebateke siyasî ya aştiyane kiriye. Armanca wî ew e, ku wê zulim û zorê ji ser xwe hilîne û mafên xwe yên netewî û rewa bi dest bixe. Wî rêzgirtina yekîtiya vî welatî kiriye û rojekê ji rojan tu ziyan negihandiyê Sûryê û pêkhateyên gelê wê. Li bervajî wê, gelê Kurd herdem berevanî di ber de kiriye û qurban jî dane. Wî ji destpêka xebata xwe de, hergav doza guhertineke demokratî ji bo tevahiya Sûriyê û gel û pêkhateyên wê doz kiriye.

Di dû re, dema ku gelê Sûriyê li Avdara sala 2011ê daxwaza azadiyê û rûmetê kir, gelê me yê Kurd ê aştîxwaz, azadîxwaz û wekhevîxwaz, ji roja yekê de û bêdudilî tevlî wê bangewaziyê bû. Ji ber ku, gelê me ji pêkhateyên din yên sûrî bêtir êş û setem ji rewşa kambax ku li Sûriyê hebû dîti bû. Çinkî ew bawer dike, eger çi guhertineke demokrat li welatê Sûriyê pêk were, berî hemî pêkhateyên din wê li berjewandiya wî û tevahiya Sûriyan be. Lê dema ku rijîma Sûriyê kir ku berê wê tevgera aştiyane berve çekdarkirinê bide û sînorên xwe ji hemî çekdarên cîhanê yên teror re vekir, rijîma Turkiyê jî ew hembêz kirin û deriyê sînorê xwe bi Sûriyê re ji wan re serbest kir û piştgiriya wan kir. Rikberiya olî jî û bi taybetî Tevgera Îxwan Mislimîn û hevnêrînên wê, bi germî derbasî qonaxa pevçûna çekdar kir.

Lê belê gelê me yê Kurd û tevgera wî ya siyasî biriyara xwe da ku di wî şerî de ne hevpar be û tenê berevaniya xwe bike. Loma jî ew li rex aliyekî nasekine û şerê aliyekî din nakir. Lê ji mafê wî ye, ku xwe biparêz e û berevaniyê di ber axa xwe de bike. Dema ku ev hêzên teror û bi taybetî Da`iş û Cebhet-El Nusra li Sûriyê êrişên xwe bi ser herêmên me de anîn, gelê me û Şervanên (Y.P.G û Y.P.J) şerê wan kirin û ji axa xwe bi dûrxistin. Ne tenê weha, çaxa ku bivehiya terorê li ser tevaya welêt çêbû û ewlehiya hin dewletên mezin metirsîdar kir, şervanên Kurd tevlî hevbendiya navdewletî ya antîteror bûn, deskeftiyên mezin bi dest xistin, dengê fedekariya wan li çar aliyên cîhanê belav bû û rêzgirtinek hêja wergirt.

Vêca ew pêşktinên mezin ên gelê me li herêmên kurdî bi taybetî û li Bakurê Sûriyê bi tevayî li dijî hêzên teror, li heza her du rijîmên şovenîst û mafxwir nehat û pirojeya wê ya Federalî wek metirsiyekê dibînin. Jixwe, rijîma Turkiyê ji zû ve dijmantiya gelê me yê Kurd dike, helwesta neyînî ji pirojeya wî ya federal re nîşan dide, bi awakî berdewam şerê wê dike û gefgurên xwe roj ji rojê bêtir bilind dike, çi ji alî siyasî, diplomatî, istîxbratî û çi jî ji aliyê leşkerî ve. Ta li vê dawiyê hewil dide ku êrişeke leşkerî ye yekser bi ser herêmên me de, bi taybetî jî bi ser Efrînê de wî ne. Lewre jî rojane balafirên xwe di ser me re difirîne, da ku (bi kêmanî) gel bitirsîne û vina wî bişkîne.

Rijîma Şamê jî piştî ku bîn pê hat û hin deskeftiyên leşkerî bi alîkariya Rûsiya, Îran û Hizibûlah bi dest xistin, Kurdan tehdîd dike û wan bi xiyanetê tewanbar dike, wekî ku ew û Turkiyê nameyên hevkariyê ji bo dijîtiya kurdan ji hev re rêdikin.

Li hember van gefgur û tewankariya her du rijîman, gelê me bi xwe bawer e, bi hêzên xwe yên parastinî û alîgirên xwe piştrast e. Ew tucarî destsar nabe û amede ye ku berevaniyê di ber ax û rûmeta xwe de bike. Lewre jî bila destlatdarên dewleta Tirk zani bin ku balafir, dorpêçkirin, tang û top û tehdîdatên wan ticarî Gelê Kurd nacefilîne.

---

**Pirtûka ... Dûmahîk**

xweşik tê ber çavan û dikeve guhê mera.

Kurteçêrok rewş û rastiya civaka kurdî ya li gundên li derdora Amedê wek mînak dibe û dide xuyan. Ew hizr, bawerî û rewşa jiyana mirovê Kurd, nemaze jina Kurd, bi şêweyekî pir ciwan, zelal û balkêş rave dike û dide nasîn.

Pirtûka “Şerefa Ristem Keya” pir hêjayî xwendinê ye, hem ji bo zimên û hem jî ji bo naskirina rewşa civaka kurdî li Kurdistana Tirkiyê li demên berî pêncî salî.

Nivîskarê rêzdar Mihemed Emîn Bozerslan li 15 miha Rezberê li sala 1034an li gundekî ji Qeza Licê- Amedê hatiye dinê. Ew ji nivîskarên navdar e li Bakurê kurdistanê. Ji salên Şêstî de ji sedsala bîstan bi zimanê kurdî mijûl dibe û bi dehan pirtûk û gelek berhemên wî yên sûdar û navdar bi zimanê Kurdî û Tirkî hene, rê li vir nîne ku hemî werin bibîranîn.

# Gotina Rêxistina Jinê ya PYDKS di Civata şêwrê ya ji bo girêdana kongirekî netewî Kurd a jinê li Rojavayî Kurdistanê

Bi navê partiya xwe, Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûrî, wekû rêxistina Jinê, bi xêrhatina we hevalên hêja dikin.

Ev dem û hemî demên we serkeftin bin.

Mijara ku emê îro li ser guftûgo bikin, mijareke girîng û bi jiyana me ya îro, her wisa bi paşeroja gelê me ve wek nan û avê girêdayî ye. Mijara me Kongra Netewî ye.

Ev mijar, di dawiya salên 1980yî de, di rûniştineke taybet a hindek siyasetmedarên kurd de wekû pêşniyar hate kirin. Di vê rûniştinê de jî tesbîteke bi vî rengî tê kirin. Em kurd cihekî me tune ku em lê rûnin û bikarin bi hev re di




berjewendiya gelê xwe de biryareke serbixwe bistînin.

Ne mizgefta me heye û ne kinîseyek me heye ku em bikarin li hev rûnin. Ji ber vê yekê pêdiviya me bi sîwaneke niştîmanî, ango bi kongreyeke netewî heye.

Ji bo vê mijarê, ango, ji bo lidarketina Kongra Netewî, bi salan e ku bi serperiştiya KNKê, ji aliyê gelek rewşenbîr û kesatiyên serbixwe ve kedeke mezin hate dayîn, lê mixabin keda van xebatkaran, di encama lihevnekirina partiyên sereke de berhem neda, pêk nehat û vê pêknehatinê hişt ku demeke zêrîn di ser netewa me re vala derbas bibe.

Hêjano! Divêt em wekû jin, vê yekê baş bizanin ku ev mesele di jiyana gelê me de gelekî girîng e, hem ji bo bi destxistina serkeftinan û hem jî ji bo dabînkirina paşeroja zarokên me gelekî girîng e.

Ji me tê xwestin ku em li ser vê meselê bi şêweyekî cidiyane rawestin.

Heger em li ser vê meselê bi cidî rawestin û bi cidî bixebitin, dibe ku careke din daxwaza li darketina kongra netewî wê bi giranî bikeve rojevê û em bikarin bi şêweyekî serkeftî vî barî bibin serî.

Li dawiyê, m serkeftina vê kombûna yekemîn ku li ser asta jinên Rojava hatiye kirin, pîroz dikim.

**Rêxistina Jinê ya PYDKS (Yekîtî)**

22.12.2017

# Verêkirina Hevalên Nemir...


Di miha berfenbarê de, gelê Kurd sê lawên xwe yên hêja, endamên Partiya Yekîtî ya Demokrat aKurd ji dest dan.

Li roja Sêşemê 19.12.2017 an, hevalê hêja Nûrî Husên Ezet ji Gundê Çeqela – Şiyê- Efrîn ku li welatê Almaniya dijî, jiyana xwe ji dest da. Darebesta wî gihîşte Efrîna rengîn û li mezelê gundê wî Çeqelê-Şiyê hate veşartin.

Li roja 232017/12/an jî darebesta gêncê hunermend û hevalê hêja Azad Misî ji Tirkiyê derbas herêma Kobaniyê bû û li gundê wî Qola hate veşartin. Hevalê hêja Azad hunermendekî


«Esmet Hesen»


«Nûrî Husên Ezet»


«Azad Misî»

çalak bû û bi saz û dengê şêrîn naskirî bû.

Li roja 292017 /12/an jî, hevalê nemir Esmet Hesen tûşî peqîna mayîneke rêxixtina DAIŞa têror bû û di encamê de jiyana xwe ji dest da. Bi beşdariya heval, malbat û hogirên wî li goristana gundê wî Sifriyê hate veşartin. Heval Esmet endamê encûmena parêzgeha Reqayê bû û rêvebirê koma Buhar a Folklora Kurdî bû jî.

Rêwresmên veşartina termên wan hevalan bi beşdariya malbat, merv û berketî, hevalên partiyê û xelkên wan dever û gundan hatin lidarketin. Gotinên partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd liSûryê û gotinên malbatên wan li ser gorên wan hatin gotin. Tê de pesna sinciyên wan ên pak hate dayîn û xebata wan ji ber gelê Kurd ve bilind hate nirxandin.

Bila serê malbat, dost, heval û hemî berketiyên wan gorbihuştan xweş be.

# Xwendin û Penaberiya Hundirîn!

**Rozad Elî**



Civaka kurdî giringiyeke mezin dide xwendina zarokan. Malbata kurd amade ye ku hemî kanînên xwe ji bo xwendina zarokên xwe terxan bike. Berê jî û niha jî, wek erk û pêwîstiyekê ye ku hemî zarokên malbatê, çi kur û keç, biçin dibistanê, bixwînin û xwendina xwe bi serî bikin.

Berî qeyrana Sûryê, bi hezaran şagirtên Kurd li amojgeh û zanîngehan dixwendin û pile û fêrnameyên bilind bi dest dixistin. Loma jî civaka krudî li Sûryê bi guhdan û hezkirina xwendinê dihate nasîn û hîn jî wilo ye.

**Bandora Qeyranê**

Mixabin! Qeyrana Sûryê rewşa xwendinê jî da ber xwe, ew jî wêran kir û bi sed hezaran şagirt û zarok ji hemî astên xwendinê bêpar kirin. Herwiha civaka kurdî jî di wî warî de berdêlên giran dan û ziyanên mezin dîtin. Bi hezaran qutabiyên zanîngehan neçar bûn ji xwendinê dûr kevin, dev ji xwendina xwe berdin, bi dawî ne kin û li welatan bibin penaber. Bi hezaran şagirtên astên din jî li seranserî navçeyên kurdî ji dibistanan man, rêjeyeke mezin jî hîç bê xwendin mane.

**Xwendin û Penaberî...**

Rast e ku piraniya xelkê me ji ber rewşên ewlehî, tengahiyên aborî, jiyanî û bêkariyê jî mişext û bûn penaber, lê rewşa xwendinê û (paşroja zarokan) jî bû bihane û sedem giring ku gelek malbat navçên xwe berdin, berê xwe bidan welatên derve yan jî li bajarên Sûryê yên mezin bi cih bibin û bixwînin.

Mirov di wê baweriyê de ye, ku her kurdek ji zimanê xwe hez dike, dixwaze pê bixwîne û fêr bibe. Lê ji bo xelkê me yê ku li welêt maye, danîna rêbazên bi zimanê kurdî ku di hemî astan de û bê amadehiyên perwerdeyî, civakî û siyasî, şagirt û xwediyên wan xistin sergêjiyekê. Ji ber ku xwendina bi zimanê kurdî li dibistanan tiştekî nû ye. Rewşa paşeroja siyasî jî hîn ji xelkê ve ne zelal e. Loma jî beşekî berçav ji xelkê me dudilî û bêzar bû ku gelo! Zarokên xwe li deverên kurdî di dibistanên kurdî de tomar bikin, lê barkin bajarên mezin û li dibistanên erebî bidin xwendin? Ji ber wê jî, îsal hejmarek hêja ji malbatên kurdî, bi bihaneya xwendina zarokan, berê xwe dan derveyî navçêyên xwe, li wir bi cih bûn û valahiyeke civakî ji bin serê wê yekê de peyda bû.

Ji erk û stûbariya Rêvebirya Xweser bû, ku bi reng û şêwene guncav û durustir nêzîk mijara perwerdeyê biba û bibe. Çinkî derketina ji navçeyên Rêvebirya Xweser bi sedema xwendinê û tiştine din jî, mişextiyeke din e û ji penaberiya derve ne kêmtir e! Ji bilî ku ji serkeftina wê û pirojeyên wê re xaleke neyînî ye giring e. Pir gerek e ku guhdaneke baş û îjdil ji bo serkeftina rêvebirya xweseriyê bibe. Bila dilxwazî, vîndariya siyasî û standina biryarên ku baş nehatine pîvan, ne bin sedema lawazkirina pirojeyên xwendina bi zimanê kurdî.

# Hevdîtina nîvê şevê



**Sêvîn Edhem Xelîl**

Dilê min di riyên windakirî de, bi tenahiya xwe dimeşiya... Ji jiyanê bi giştî aciz bû bû... Xwe radestî bayê qederê kiri bû... Di nav kolanan de, li ber roniya heyvê dimeşiya... Roniyek vebrûstî çîîîîk dida... Min meyze kir... ew ronî tu bû... Meyzekirina çavên te, hîşt çavên min mîna stêrkan vebirûsin... Vebirûsa dil li dil ket, silavek dan hevdu... Bi lihevketina her du dilan... heyv, erd, ezman û stêrk dikeniyan... dikeniyaaan; kenekî fedooook li ser rûdêmên min û te hate wêne kirin... hate xêz kirin. Axaftinên hûr hûr di navbera lêvan de diherikin... diherikin. Giyanan hev du hembêz kirin û soza mayîna dawî di asoya evîneke bê sînor de Nûsaaandinnn... Xwedawenda jiyana min tu yî... Roniya her du çavan tu yî... Kenê te ji bo min... dibe jiyaaan... dibe ronahîî... dibe evîîîîn û her û her... dibe bayê nefesa min...

# DI QUNCIKÊN REŞ DE MEMÎNIN

**Ilham Osman**

Her civakek bi bîr û baweriyan xwe tê nasîn. Ew bawerî dibe nasnama wê civakê. Her çiqas civak bi guherînan bandor bibe jî, li ser rûyê wê navnîşeke mezin dimîne û pê tê nasîn. Tevî ku em di sedsala 21ê de ne û digel pêşketinên teknolojî, rûdana zanîn û bilindbûna asta xwendinê, lê mirov matmayî dimîne gava dibîne ku hîn hin riwiştên şûndemayî rola xwe di civakê de dilîzin.

Mijara çûna hin kesan ba şêx û xoceyan ji bo çareseriya pirsên civakî yan tendurustî mijareke girîng e. Lê goftûgo di vê mijarê de hin bi tirs û guman e. Ji ber ku hîn hin kes ji verşandina rastiya vê yekê bi tirs in û baweriya wan dighêje asta pîrozkirina wan baweriyan!!! Gelo ma çima hin kes berê xwe didin van şêxan? Û ta kîjan astê ew kanin çareseriyê ji arîşeyên kesanî re bibînin?!!!!

Gava nexweşiyek di canekî de pal vedide, ger bijîşkên ku ewqas sal xwendine û lêkolîn kirine nikarîn ew derman bikirana, yan keçekê bextê zewacê jê re venebûye, yan jî hin kes ger di xizaniyê de mabin, ma nivişt dê çi sûdê lê bikin?!!

Pirsek bala me dikşîne, çima ew kesên ku bi vê baweriyê re ne, piraniya wan jin in?!! Bêguman nezanî, rewşa tevlihev û şûnketî sedemên sereke ne. Xwendin û zanîn careseriya her nexweşiyekê ye. Ji ber ku ew maka pirsgirêkan lêkolîn û çareser dike. Lewra jî pêwîst e, em hertim berê keç û xortên xwe didin xwendinê. Ji dîroka kevin de, jina kurd rêveberiya civaka xwe dikir, çima îro xwe radestî hin baweriyên pûç û bê sûd dike?!! Hêjayî gotinê ye ku pir pirsgirêkan ji bin serê wan baweriyan de rûdane û kombaxî jî bi serê jinan de hatiya!!! Erêniya teknolojiyê diyar e û li ber destê her kesî ye û kesên pispor jî ne ji valahiyê bûne pispor. Ta ku civakek xwe ji nezaniyê xelas bike, divê perdeya tiştên vala bidirîne û ala zanînê hilde. Yan jî wê herdem di binê kortala nezanî û şûnmayînê de binale û bimîne.



«Wêne bi kamêra Mihemed Bilo»

# Jîngeh û Parastina Wê!



**M.Elî**

Li bajarê Efrînê û li deverên derdora wê, gemarkirin û wêrankirina jîngehê bi şêweyekî balkêş dest pê dibe û pirsgirêkeke îjdil peyda dike. Çinkî roja îro bi dehan matorên jenandina eletrîkê li kolan û kuçeyên bajêr dû û kulxana reş berdidin. Cihê kelandina qitrana qîrkirina rêkan û civandin û şewtandina gelaş û gemara bajêr jî tenê dor 45- kîlomitran li Başûr Rohilata bajêr e. Matorên eletrîkê, kelandina ziftê û şewata qelaşê, li rojê bi tonan kulxan û teniya reş berdidin ezmên û bi ser bajêr, gundan, zevî, darûber û malan de dibarînin. Dûyê reş û kulxana ku ji wan derdikeve mijdûmaneke tarî li ser beşê Bakur ji deşta Cûmê, gundên deverê û li ser bajarê Efrînê çêdike. Ew mijdûmana jehirdar ne tenê ji mirov re ziyandar e û nexwaşiyên metirsîdar peyda dike, ew hemî war û endamên jîngehê jî kavil dike, nemaze jî li Deşta Cûmê û Çiyayê Lêlûn.

Li hêleke din, av û bermahiyên qirêj û jehirdar jî ji gelek karxaneyê pîşesazî û lûleyên ava qirêj diherikin ser gelî û kor, nemaze jî ser newala Çemê Efrînê, bi ser bajêr û gundên Çûmê de diherikin, dibin jêdera hemî cureyên nexwaşiyan û jiyanê di newal û parava çem de wêran dikin.

Li aliyekî din, rola welatiyan jî di wêrankirin û genedelkirina jîngehê, nemaze jî di gemarîkirina seyrangehan de pir berçav e. Mirovên me bi xemsariyeke pir mixabîner bi hawîrdora welatê xwe re têkildar dibin û wê gendele dikin. Hemî cure qirêj, bermahî û tiştên ziyandar li cih.........

7

# Dem li Benda Kesî Namîne!!



**Nazdar Hesen**

Kêlî û demjmêr li pey hev bê rawestin digerin. Roj û şev diqedin. Hefte û meh diborin. Demsal û sal jî tên û derin bêyî ku haya mirov jê hebe çawa diqedin û derbas dibin. Her ku dem derbas dibe, mirov bêtir bi nirx û girîngiya wê hestiyar dibe. Ji ber ku dem li benda kesî namîne û ne jî radiweste. Piraniya caran mirov li demên xwe yên borî û derfetên ji dest çûne poşman dibe, xwe gunehkar dibîne û loman ji xwe dike. Belê rast e jî, tu hêz û tu kes nikare bûyer û tiştên borî biguhêre, ger mirov razî be û yan na, qet dem venagere. Bi herawayî jiyan wê bidome, lê ya pêwîst ew e, ku her demekê mirov li xwe vegere, ji jiyanê serboriyan bigire û li ser wê bingehê siberoja xwe, wê bi pîlan birêse, demên xwe bêtir bi sûd û bikêr derbas bike, ji zîndana bûyerên borî xwe rizgar bike û bi demê re bibe heval. Lewra li dawiya dawiyê, em dikarin bêjin, dem di destê mirov de ye; ew dikare bi demê re bimeşe yan li şûna demê bimîne!!

# NAMEYÊN EFRÎNÊ

*Merwan Berekat*

**- 1 -**

**Hin dimirin, hin dibin pakrewan, hin jî çavdêriya sînorên rûmetê dikin. Hin digirîn, hin rondikên dayîkan radimûsin û hin jî zarokên xwe fêrî stranên axê dikin.**

**Bihna xwîna law û keçên min ji hemû gewdeyê welatê pakrewanan Kurdistana pîroz û bihuşta zemînê difûre û tucarî wan ji banga şoreşên Kurdan re negotine na û deriyê comerdiya xwe li pêş berxwedanê negirtine….**

***Efrîn im….***

**- 2 -**

**Mirina di nav pêlên deryayê de dibe çîroka masiyan û navnîşana wê li ser qûmeke livok tê nivîsandin. Dîlana li pişt sînorên bêpişt şahiyeke watepûç e û vedenga wê li guhên ker vedipeke. Hûn dengê çavsor, destbixwîn û kîndaran tev dibihîsin, ma qey şerm e ku hûn carekê dengê hev û ji bo hebûna xwe û min bibihîsin?!**

***Axa Efrînê me…***

**- 3 -**

**Agahdar bin; em nasnameya dîrokeke dêrîn in, semaya şax û pelên me ji dilsoziya bê ye û em bi destên siwarên bê hatine çandin. Reh û tamarên me giyanên gunehkar seza dikin û kokên me çîrokên pêdariya kurên rojê li bejna xwe nîgar dikin. Ji Lêlûnê dil ji kêvir, ji Hawarê enîberz û ji Zoyê Giran pirsa me bikin. Belê; destaneyên me ji Zinefon, Hîrodots û Diqilyanos bipirsin. Gortistanên Romî û hemû êrîşkeran ji axa ku tamarên me dimêjîne, bipirsin.**

***Em darên mazî û zeytûnê ne***

**- 4 -**

**Di çavên demê de dilpakî û zelaliya mirovperwer diherikin, diherikin û diherikin. Dildarên jiyanê û xemlandina deşt, newal, gelî û sîngê çiyan in. Ji tîbûna neyar, xinz û nokeran re jehra reş in.**

***Em kaniyên Çiyayê Kurmênc in.***

**Jîngeh û ... Dûmahîk**

û deverên seyrangehan, li ber rêkan, li perava Çem û kaniyan, li bin daran û li nav çiya û daristanan dihêlin. Bi rastî, ew xemsarî cihê mixabinî û dilêşeke mezin e û şana sincî û perwerdeyên civakî yên ne baş û lişûnmayîna civakî ne.

Kurdewerî û welatperwerî ne tenê hest û gotin û şor in; welatînî hezkirin û parastina her tiştekî welêt e. Dar û ber, çiya û newal, gul û geya, av û ax, mirov û lawir û hemî hêmanên din eger mirov wan bi dilsozî û hezkirin neparêze û destê xwe di ser re negire, hezkirina wî ji welatê re hîç ne rastgo ye û ew ne welatperwere jî. Di vî warî pêwîst e birîna darên daristanan were rawestandin û parastina wan ji bîra herkesekî û rêvebiriyê jî neçe.

Rola saziyên dewletê, rêvebirî û saziyên civaka sivîl jî di parastin û zindîhîştina sirûşt û jîngehê de pir giring e. Pir pêwîst e ku ew jî bi erk û stubariyên xwe rabin û jingehê biparêzin.

Nêrevaniya ji nêzîk ve û danîna yase û zagonanên taybet jî di vî warî de zor pêwîst in. Çinkî hîn gelek karxane bi şêweya berî bi sed salî dixebitin! Elfebêta têknolociya nûjen ku dostê jîngehê ye bi kar nînin! Wekî ku jîngeha welêt û parastina tendurustiya wê hîç ji wan re ne giring e, ne di bîra kesekî de ye û tenê qezenckirina madî serdefter!

Bi rastî eger doxa(rewş) gendelekirin û wêrankirina jîngehê li Efrînê wilo berdewam bike, ziyanên mezin wê jê peyda bibin û dê me bajo ser rewşine sirûştî yên pir xirab û bêveger.

Di warê danûstandina bi jîngehê re, mirov ne tenê ji xwe re û li serê xwe dike, ew ji neweyên paşrojê re jî dike. Zor giring e ku em sirşûtê mîna roniya çavan biparêzin, û geştir, baştir û xweşiktir bikin!.

**Nameyek Spasî û Pîroziyê**

Rojbaş... Sersala we pîroz be, hêvîdar in win baş û şa bin. Spas ji bo nivîsarên we ji rojnama we Newroz re, hêvîdar in li sala 2018an jî win li wê xudî derkevin û ji nivîsarên xwe yên giranbuha bêpar nekin.

# Osman Baydemir... Dengê Rastgo Yê Gel



Li roja 132017/12/an, di rûniştineke perlemana Tirkiyê de, perlemnterê Partiya Gelên Demokrat (HDP) rêzdar Osman Baydemir, dema ku xwe da nasandin wiha got: Ez lawê gelê Kurd im, yanê ez nûnerê Kurdisatnê me, bana vê perlemanê jî ya gelê Kurd û Tirk e. Gotina rêzdar Baydemir li xweşiya cîgira serokê encûmenê ne hat, lewre ducarkî pirs kir û bi kêrç got: Rêzdar Baydemir, Kurdistan li kûderê ye? Baydemir jî hîç li ber ne sekinî û destê xwe li ser dilê xwe xist û got: Di vir de ye... di vir de ye... kurdistan di vir de ye! Wê hîngê bi biryara destlatê Baydemir du katjmêran ji perlemanê hate derxistin.


Ew helwesta durust, mafdar û mêrane ya rêzdar O. Baydemir, çend rojan bû mijara sereke di torên medyayê û navgînên civakî de. Wê hest û nest û dilxwaziya dilên çel milyon Kurd derbirand û rastiya rast got. Helwesta rêzdar Baydemir ji binê birîn û êşeka gelê Kurd ya kûr derket. Lê belê wî hîç tiştekî nû ne got, tenê wî rastî anî bîra Tirkan û raya giştî. Çinkî di ((mîsaqa Millî)) ya sala 1923an de ku dewleta Tirkiyê li ser hatiye avakirin, mafê gelê Kurd li gel miletê Tirk hatiye tomarkirin û çespandin. Lê nijadperestên berê û îslamgirên niha ku Erdoxan û Partiya Dad û Geşepêdanê (AKP) serkêşiya wan dike, hemî zagon, destûr, maf û dîrok jî dane paş xwe, nabînin û lê mikur netên.

Osman Baydemir nûnerê wîlayeta Orfê ye di perlemana Tirkiyê de. Piştî ku serokê Partiya HDP rêzdar Selahdîn Demirtaş û hevserokê wê hatin girtin, rêzdar O. Baydemir bûye berdevkê partiyê.

Osman Baydemir li zanîngeha Dîcle li Amedê fekulta Mafnasiyê xwendiye û dîploma xwe wergirtiye. Ew ji sala 1995an ra sala 2002an berdevkê rêxistina mafên mirovan bû li Amedê. Piştre bû serokê şaredariya mezin a bajarê Amedê û niha jî nûnerê wîlayeta Orfê ye di perlemana Tirkiyê de.

# Mûzîkvanê Kurd Kîhan Kulhorî Xelata "Oskar" a Mûzkê Wergirt

Li gora hewalgeha(wekalet) Serdema Îranê, elbûma "Sing Me Home" ji saz û lêdana sazvanê Kurd Kîhan Kulhor xelata "Grammy Awards" a navnetewî wergirt. Grammy Awards mezintirîn xelata gerdûnî ye di warê mûzîkê de. Ew ji hêla ekedîmiya "Zanist û Hunerên Tomarkirî" - National Academy of Recording Arts and Sciences- tê dayîn û beramberî xelata "Oskar"



a sînemê ye. Ew her sal ji bo çêtirîn elbûma mûzîkî, xweşiktirîn stran û baştirîn hunermendê gênc tê dayîn. Ew xelat îsal /2017/, bû para tîma "Riya Hevrîşmê" ku mîna tîma her baş li cîhanê hate vebjartin û K. Kulhorî jî endamekî wê ye.

Hunermendê mûzîkvan K. Kulhor di lêdana kemencê de navdar e. Gelek elbûmên wî yên mûzîkê derçûne û ji gelek filmên sînemayê re saz çêkirine, gelek xelatên gerdûnî wergirtine. Ji berhemên wî yên navdar / Bajarê Kerûlal/, ew jî ji bo bajarê Helebçe hûnandiye û dayê.

K. Kulhorî 54 salî ye, ji bajarê Kermeşanê ji Kurdistana Îranê ye. Malbat xwe di şerê Îraq û Îranê de hatine kuştin. Ew ji giringtirîn çalakvanê aştiyê ye li cîhanê jî.

K. Kulhorî li zanîngehên Îtalî, Kenedî û Emerîkî hunera mûzîkê xwendiye û.

Pîroz be ji henermendê Kurd K. Kulhorî re, bi hêviya gelek xelatên mezintir û berhemên hêjatir.

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**